

Helbesteke Kurdî Garşûnî ya David Barzane*

MUSTAFA DEHQAN Û ALESSANDRO MENGOZZI

JÎ ÎNG: FEXRIYA ADSAY

Puxte: Ev weşana zêmara keşeyê keldanî David Barzan (m. 1880) xwe dispêre destxeta wî ku bixwe helbestên wî yên bi suryankî, aramiya nû û kurdî. Ev helbest di nav peywenda kevneşopa vekirîbûnê ya Dêra Rojhilat a bo pirzimanî û profîla sosyolinguîstîk a suryaniyên Rojhilat ku li Kurdistanê dijiyan, tê pêşkêşkirin. Ev pergala sofîstîke lê kêma nivîsîna fonemên kurdî ya bi zimanê suryankî kevneşopên suryaniya klasîk bi kevneşop û nîşaneyên fonetîk ku ji bo zimanên din tê bikaranîn, bi taybetî erebî û aramiya nû, vê girêdide. Ligel edîsyona deqê tîpguhêziya bo ortografiya kurdiya nûjen û wergera îngilîzî jî heye.

Peyven sereke: David Barzane, kurdî, elfebeya suryankî, pirzimanî, Behdînan

Ji sedsala 19mîn vir ve, wergerên Mizgînê bo cûreyên kurdî, gelek caran bi yek pirtûkekê sînorkirî bû, ji aliyê mîsyonerên rojavayî an sermetranên kildanî hatine sponsorkirin û ji aliyên zanayên kurd ve hatine amadekirin an serastkirin.¹ Bi alfa-

* Ev gotar bo bîranîna Mirella Galletti, ku jiyana xwe bo dîrok û çanda kurdî terxan kiriye tê îthafkirin. Mustafa Dehqan nivîskarê beşa *Deq û Wergerê* ye û spasîyên xwe yî germ pêşkeş dîke bo Newzad Hirorî û Michael L. Chyet ku xwendina deqê pêş ve birin. Alessandro Mengozzi deqa bi suryankî bo edîsyonê amade kir û nivîskarê destpêk û beşên *Suryankiya rojhilat garşûnî û pirzimanîya Kurdistanê, David Barzane, û kurdî di nivîsîna suryankiya rojhilat* de.

1 M. Dehqan, "A Kirmaşanî Translation of the Gospel of John" (Journal of Eastern Christian Studies 61:1&2 [2009]), 208-9.

beyên cuda hatine çapkirin: latîni, erebî û ermenkî. Deqên bi suryankî jî tê de, derbarê deqên kurdên xiristiyan de ku wek destxet hatine parastin gelek kêma tiştê zanîn. Nivîskarên suryanî him rojava him rojhilat bi kurdî garşûnî nivîsandine û pir kêma deqên tê zanîn an hatine çapkirin belkî dikare bibin delîlê diyardeyêke berfirehtir û kevneşopeke wêjeyî ya xurttir û berbelavtir. Bi kurtasî, ev deq cazibeya çandî û dînî ya zaravayên kurdî bo keşeyên suryanî yên ortodoks û kildanî piştrast dikin.

Pennacchiotti di helbestên suryanî yên klasîk ên bi zaravayê kurdî ya herêma Behdînanê (Zaxo-Dihok li başûrê Kurdistanê), qeraxa başûr-rojhilata herêma fireh a kurmançî, gramerekê tarîf dike. Deq jî aliyê keşîşê keldanî Ablaḥad ‘Odišo’ yê manastira Rabban Hormizd a nêzî Alqoşê hatiye afirandin û li muzeya Iraqê wek destxet hatiye parastin.² Harrak teswîreke temamî ya destxetê dide, ku ligel gramera Ablaḥad a wek riste biwêj û gotinên pêşyan ên kurdî, wergera çend beşên pirtûkên Peymana Nû (The Old Testament), du îlahiyên *li ser Vejînê* ku jî aliyê Keşe Ablaḥad di sala 1888an de bi kurdî hatiye nivîsandin dihewîne.³

Kreyenbroek helbesteke têra xwe dirêjtir a bi kurdî ku bi alfabe ya suryankiya rojava hatiye nivîsandin û bo Maphrynoyo Basilius Simonê Tur Abdînî (m. 1740) hatiye ithafkirin weşandiye. Helbest wek *lawij* ‘kilama dînî’ tê binavkirin û jî 51 çarînan pêk tê. Her çarîn bi xîtaba *lo* dest pê dike û jî çar rêzikan pêk tê. “Bo wezna ku dirêjahî an hejmara kîteyan xwe dispêre bê beyankirin modeleke yekşêwe nikare bê tespîtkirin.” Neliheviya prosodîk (teknîka weznê) jî bi performansa muzîkî a deqê re ne hevaheng e. Çar rêzîkên her çarîne bi gelemperî bi rêzika dawî ya îlahiyê ve tê girêdan. Helbest xîtabî mijarên tîpîk ên xiristiyaniyê yên bo îqnakirinê dike: vejîna piştî dawîya dinyê, dadgehkirina dawîn û hewcedariya tobekirinê, mirin û beyhûdebûna vê dinyayê, ihtîşama ezîzan (saint) li bihuştê, cizakirina gunehkaran li cahnimê.⁴ Hin jî van babetan di helbesta kurdî garşûnî jî de ku jî pirtûkeke stranana jî sedsala 19mîn a helbestkarê kildanî David Barzane hatiye girtin û wê di vê gotarê

2 F. A. Pennacchiotti, “Un manoscritto curdo in karshuni da Aradin (Iraq)” (Annali dell’Istituto Universitario Orientale di Napoli 36 [1976]), 548-52.

3 Ms. 18078 in A. Harrak, *Catalogue of Syriac and Garshuni Manuscripts. Manuscripts Owned by the Iraqi Department of Antiquities and Heritage*, CSCO 639, Subsidia 126 (Leuven: Peeters, 2011), 28-34. Harrak qala wergerên din î kurdî yên beşên Mizgînê û çavkaniyên xiristiyaniyê ku jî aliyê Yūsifê ‘Aqrāyî di sala 1855a de hatiye kirin dike. Di nav koleksiyona destxetên *durekyaṭa* (îlahiyên bi aramiya nû) û *mēmre* (têgeheke bo helbest û îlahiyên ne-çarîn ên di nav kevneşopa suryankiya rojhilat a dereng de tê bikaranîn) de tîn parastin, wek ms. 96 of the Diocese of ‘Aqra di nav Y. Habbî, “Maḥtūtāt abrašiyat ‘Aqrā,” di nav *Fahāris al-maḥtūtāt al-suryāniyya fî l-‘Irāq*, (Baghdad: Al-Maḡma‘ al-‘ilmī al-‘irāqī, 1981), 70 hatiye lîstekirin; niha ne li ber dest e.

4 P. G. Kreyenbroek, “The Lawij of Mor Basilius Shim’un: A Kurdish Christian Text in Syriac Script” (Journal of Kurdish Studies 1 [1995]), 29-35. Di nav G. A. Kiraz, *Tūrrāš Mamllā. A Grammar of the Syriac Language*, c. 1 *Orthography* (Piscataway, NJ: Gorgias Press, 2012), 306-9, paragrafa li ser “Kurdiya suryanî” teswîreke bi hurgilî ye bo awayê tîpguhêziya deqa Kreyenbroek weşandiye.

de bê pêşkêşkirin, tê ditin. Pirtûka David wê di nav çarçoveya bandora wêjeyî ya pîrzimaniyê de, taybetî di helbestê de, di nav nivîskarên suryankiya rojhilat de bê pêşkêşkirin. Wê beriya edîsyona deqê li ser pergala tîpguhêziya garşûnî ya di destxeta otograf de [destxeta nivîskar bixwe], li gor ortografiya kurdiya nûjen û wergera bo îngilîzî, hatiye bikaranîn çend hişyarî hebin.

Garşûniya suryankiya rojhilat û pîrzimaniya Kurdistanê

Nivîsa suryankiya rojhilat ji bilî suryankiya klasîk ji bo nivîsandina çendîn zimanên din hatiye bikaranîn. Ev ji ber vê ye ku dêrên suryanî, taybetî Dêra Rojhilat, ji berê de baş techizatkirî ne ku pîrzimanî û pîrçandîtîyê re rû bi rû bibin⁵ ji ber kevneşopa xwe ya muazem a keşetî û misyoneriyê ku li seransera Rojhilata Navîn dane meşandin: li Mezopotamya, Nivgrava ereban û li herêma Kendavê, welatê eceman, Asyaya Navîn, Hindistan û Çînê. A din, piraniya xwendeyên cimaeta wan duzimanî bûn/ne. Taybetî di dewra osmanî de, suryanîyên rojhilatî kevneşopa xwe ya erebî garşûnî, him di destxetan de him di nivîstekan (inscription) de, tam li gor modela garşûnî, yanê erebiya-bêtir erebiya serdema navîn- ku maruniyan bi elfebeya suryankiya rojavayî nivîsandine, ji sedsala 13mîn ve di nîşeyên arşîvî yê marjînal de û ji sedsala 15mîn vir de di hemû desxetan de.⁶

Lê hê ewiltir ji hin mînakên balkêş ên wêjeyî ya helwesta suryanîyên rojhilatî ya

- 5 Bnr lêkolîna tîpolojîk "Garşûnography I: Syriac as the Target Script" di nav G. A. Kiraz, *Tûrrâş Mamllâ*, 291-322, û, li ser deqên tirkî an tirkî û farisiya garşûnî, di nivîsandina suryankiya rojava an rojhilat, li Rojhilat an jê wêdetir: U. Marazzi, "Sull'importanza dei testi osmanli in caratteri siriaci," di nav *Studia Turcologica memoriae Alexii Bombaci dicata*, ed. A. Gallotta û U. Marazzi (Napoli: Istituto universitario orientale, 1982), 339-65; D. V. Proverbio, "Turco-Syriaca. Un caso estremo di sincretismo linguistico e religioso: i libri di Tommaso Şarrâf da Edessa (XVIII sec.) nella biblioteca portativa di Tommaso Caldeo da Alqôş" (Miscellanea Bibliothecae Apostolicae Vaticanae 11 [2004]), 583-635; H. Younansardaroud, "Die türkischen Texte aus dem Buch 'Manuel de Piété' von Paul Bedjan (1893)," di nav *Studia Semitica et Semitoamitica. Festschrift für Rainer Voigt anlässlich seines 60. Geburtstages am 17. Januar 2004*, Alter Orient und Altes Testament 317, ed. B. Burtess, J. Tropper û H. Younansardaroud (Münster: Ugarit, 2005), 489-525; P.G. Borbone, "Syroturcica 1: The Önggüds and the Syriac Language," di nav *Malphono w-Rabod-Malphone. Studies in Honor of Sebastian P. Brock*, Gorgias Eastern Christian Studies 3, ed. G. A. Kiraz (Piscataway, NJ: Gorgias, 2008), 1-18; Idem, "Syroturcica 2: The Priest Sârgis in the White Pagoda," (Monumenta Serica. Journal of Oriental Studies 56 [2008]), 487-503; Idem, "Syroturcica 3: Hulegu's rock-climbers. A short-lived Turkic word in 13th-14th century Syriac historical writing," di nav *Studies in Turkic philology. Festschrift in honour of the 80th birthday of Professor Geng Shimin* (Beijing: Minzu Dashue Chubanshe, 2009), 285-94; M. Maggi and P. Orsatti, "Two Syro-Persian Hymns for Palm Sunday and Maundy Thursday," di nav *The Persian Language in History*, ed. M. Maggi û P. Orsatti (Wiesbaden: Harrassowitz, 2011), 247-85; N. Sims-Williams, "Early New Persian in Syriac script: Two texts from Turfan" (Bulletin of SOAS 74:3 [2011]), 353-74; hemûyan de çavkanî hene.
- 6 A. Mengozzi, "The History of Garshuni as a Writing System: Evidence from the Rabbula Codex," di nav *CAMSEMUD 2007. Proceedings of the 13th Italian Meeting of Afro-Asiatic Linguistics, held in Udine, May 21st-24th, 2007*, ed. F. M. Fales and G. F. Grassi (Padova: S.A.R.G.O.N. Editrice e Libreria, 2010), 297-304; E. Braidà, "Garshuni Manuscripts and

li hember pirzimaniyê dikare di “*divân*”a ku bo helbestvan Xamis bar Qardahe yê di dehsalên dawî yên sedsala 13mîn de çalاک bû, hatiye îthafkirin, bê dîtin.

Di pirtûka (*Book*) wî de îlahî, kilam û çarînên li ser mijarên dînî û nedînî bi suryankiya klasîk hatiye nivîsandin, lê gelek şêwe û motif kokfarisî ne. Di nav helbestên suryankî yên Xamis de du hebên dişibe garşûnî hatine parastin: ihtimal e îlahiyeke derengtir Li ser Aboriya Pîroz (*On Divine Economy*), ku tê de risteyên suryankî û wergera wan a bi tirkiya azerî -di sernavan de wek ‘monxolî’ hatiye bina- vkirin- li dû hev tîn û sê çarîn li ser evîn û meyê ku di rêzikan de suryankî, farisî û çend peyvên erebî di nav hev de ne.⁷ Bi taybetî di helbesta dû re, ku xuyaye ya Xamis e, helbestvan bi qestî hostatiya xwe ya helbestkî ya pirzimanî nîşan dide û bi eşkereyî hurmet nîşan dide bo şêweya helbesta farisî. Ev awayê hostatiyê ya pirzimanî û nav-zi- manî xuyaye taybetiyeke çanda îslamî ya wê dewrê ye⁸ û ji ber vê yek ji taybetiyên berbiçav a ronensansa suryankî ye (sedsalên 10-13mîn), yanê vekiribûna rewşenbîrên suryanî yên serdema monxoliyan bo îslamê yanê bo bandora erebî-farisî.⁹ Bi awayekî manend, di helbesta aramiya nû de (ji dawiya sedsala 15mîn vir de) ku ducarkirinên pirzimanî nîşaneyê uslûba xezineyê zimanî ya helbestvan û xwînerên wan e, em bikaranîna hostatiya peyvên alternatîf dibînin: peyvên kok-aramî ligel wan peyvên hevwater yên ji zimanên din, wek mînak suryankiya klasîk, erebî, kurdî, tirkî an farisî, hatiye bikaranîn.¹⁰

Ev di helbestên kurdî de jî şêweyek tîra xwe belav e: wek mînak bnr., *p’êxamb- er... û enbîya* di helbesta David Barzane 1. 11c de ku li jêr hatiye weşandin. Derveyî

Garshuni Notes in Syriac Manuscripts,” (Parole de l’Orient 37 [2012]), 181-98. Kessel van demên dawî de destnîşan kir ku destxetêke dawiya sedsala 13mîn “yek ji delîlên ewiltirîn a sîstema nivîsandina garşûnî ku bo deqên wêjeyî tê bikaranîn û heta niha ya ewiltirîn, di hewîne. Wek şahidekî girîng e mirov bibîne taybetî bikaranîna garşûnî di kevneşopê suryaniyên ortodoks de ku gelemperî tê qebûlkirin beriya wê kevneşopê marunî hebû”: G. Kessel, “The importance of the manuscript tradition of the ‘Book of Grace’ for the study of Garşûnî” (Parole de l’Orient 37 [2012]), 215.

- 7 A. Mengozzi, “Persische Lyrik in syrischem Gewand. Vierzeiler aus dem Buch des Khamis bar Qardahe (Ende 13. Jahrhundert),” di nav konferansa *Syrologentag* (Göttingen, 16.-17. Kanûn, 2011), wê derkeve. Anton Pritula (Hermitage Museum, St Petersburg) çapeke rexneyî ya îlahiya duzimanî Li ser Aboriya Pîroz (*On Divine Economy*) amade dike.
- 8 Bausani vê fenomenê wek metafora muhtem a guhartoyên muzîkî yên li ser babetekê teswîr dike: ev babet di çanda belav a farisî-îslamî ye û guhartin bi zimanên neteweyî tê kirin, wek ku şêwazên cuda yên heman wêjeyê bin bi hêsanî tîn guhartin. A. Bausani, “Letteratura neopersiana,” in *Storia della letteratura persiana*, ed. A. Pagliaro and A. Bausani (Milano: Nuova Accademia, 1960), 167.
- 9 G. B. Teule, “The Syriac Renaissance,” in *The Syriac Renaissance*, Eastern Christian Studies 9, ed. G. B. Teule and C. Fotescu Tauwinkl (Leuven: Peeters, 2010), 23-8.
- 10 A. Mengozzi, *A Story in a Truthful Language. Religious Poetry in Vernacular Syriac from (North Iraq, 17th century)*, CSCO 590, Scriptorum Syri 231 (Leuven: Peeters, 2002), 100-2. Di wêjeya îbrankî ya aramiya nû de li ser heman mijarê, bnr. Y. Sabar, *A Jewish Neo-Aramaic Dictionary*, Semitica Viva 28 (Wiesbaden: Harrassowitz, 2002), 55-6.

Kurdistanê, ducarkirinên pirzimanî taybetiyeke şewazî ya belav a wêjeyên îslamî ye, ku ligel peyvên erebî hevwaterên wan î di tirkî û farisî de tèn bikaranîn.¹¹

Bandora mezintirîn a kurdî li ser aramiya nû ya di hemû astan de -fonolojî, morfolojî, sîstema devkî, peyvên sereke yên zimên, awayê vegotinê, gotinên biwêjkî-bala lêkolîneran kişandiye û encamên lêkolînan hewce nake em li vir dubare bikin.¹² Gotareke Chyet bi taybetî balkêş e, di vê de di nav diyardeyên zimanî de girtî namîne, lê bala xwe dide wêje, folklor û saziyên hevpar ên civakî û çandî jî.¹³ Dengbêj û çîrokbêjên gerok parçeyek kevneşopî ya folklorê kurdî ye ku ji aliyê misliman, xiristiyên û cihûyan ve jî tê parvekirin. Di sala 1870an de helbestkar û dengbêjê yê navdar Dawidê Kor kilamên aramî û kurdî bi Albert Socin dabûn nivîsandin.¹⁴ Tê famkirin ku di her du zimanan de jî dikaribû stran bigota. Kevneşopa çîrokbêjên cihû, gelek caran nexwende û bi awayekî pir normal li ser daxwazê dikaribûn du an sê -kurdî, aramiya nû û erebî- zimanan bigotina, heta nifşên vê dawiyê jî didomand.¹⁵

Vekiribûna kevneşopî ya Dêra Rojhilat a berew pirzimanîyê û profîla dewlemend a sosyolînguîstîk a suryaniyên rojhilatî ku li Kurdistanê dijîn, ev peywendên ku divê em tercîhên zimanî yên helbestvan David Barzaneyê sedsala 19mîn ku bi suryankiya klasîk, aramiya nû û kurdî helbest nivîsandine, tê de bidin rûniştandin. Dema em duzimanîya aramî û kurdî ya gelek xiristiyên li Kurdistanê dinêrin, qasî ku dizanim, surprîz e ku ew yek ji pir kêr suryaniyên rojhilatê ye ku teşebus kiriye risteyên xwe yî kurdî derbasî nivîsê kirine.¹⁶

- 11 A. Bausani, "Le lingue islamiche. Interazioni e acculturazioni," in *Il mondo islamico tra interazione e acculturazione*, ed. A. Bausani and B. Scarcia Amoretti (Roma: Istituto di studi islamici, 1981), 9.
- 12 O. Kapeliuk, "Language Contact between Aramaic Dialects and Iranian," di nav *The Semitic Languages. An International Handbook*, HSK 36, ed. S. Weninger (Berlin: de Gruyter, 2011), 738-47; Eadem, "A Contrastive Analysis of Tenses in Urmi Neo-Aramaic and in Kurdish," di nav *Beiträge zur semitischen Dialektologie. Festschrift für Werner Arnold zum 60. Geburtstag*, ed. R. Kutty, U. Seeger and Sh. Talay (Wiesbaden: Harrassowitz, 2013), 161-70.
- 13 M. L. Chyet, "Neo-Aramaic and Kurdish: An Interdisciplinary Consideration of their Influence on Each Other" (Israel Oriental Studies 15 [1995]), 219-49.
- 14 E. Prym and A. Socin, *Kurdische Sammlungen. Erzählungen und Lieder in den Dialekten des Tûr 'Abdîn und von Bohtan*, a. *Die Texte* (St. Petersburg: Commissionaires de l'Académie Impériale des sciences, 1890), xvi.
- 15 Y. Sabar, *The Folk Literature of the Kurdistanî Jews: An Anthology*, Yale Judaica Series 23 (New Haven, CT: Yale University Press, 1982), xxxvii-xxxviii and M. L. Chyet, "Neo-Aramaic and Kurdish," 228-9.
- 16 Harrak (*Catalogue*, 32-3) du îlahiyên *Li ser Vejîne* yên Ms. 18078 yê Muzeya Iraqê (f.157v û 168v) wek deqên ji aliyê keşe rahib Ablahadê Alqoşî wergerandiye bo kurdî pêşkêş dike. Helbesteke kurdî bi suryankiya rojhilat di sê destxetan de ku bo Eduard Sachau hatine kopîkirin tê parastin. E. Sachau, *Verzeichnis der syrischen Handschriften der Königlichen Bibliothek zu Berlin*, B. 1 (Berlin: Asher, 1899), 434-44. Ms. 133.6 (ji aliyê J. Shamir li Musilê 1883a de hatiye kopîkirin) temama helbestê bi wergera erebî ku di navbera risteyan de hatiye nivîsandin, tê de ye; di ms. 134.1 de (ji aliyê nivîsevan Fransîs li Telkepeyê 1883a

A din, ew tekane helbestvanê suryankiya rojhilat a dereng û aramiya nû ye ku berheva destxetên wî yên helbesta li ber destê me ye û tê de cih daye hûrgiliyên otobiyografîk. Dibe ku ev diyarde bi hev ve giredayî bin. Ihtimal e di amadekirina berheveke helbestan de wî bi niyeta bo bikaranîna şexsî dabe dû ilhama xwe ya helbestî û zimanî. Ji aliyekî din ve, helbestên suryankiya rojhilat a dereng û aramiya nû bi gelemperî di desxetên curbicur an antolojiyên xwedî naverokeke dînî û erkeke ayînî de hatine parastin. Nivîskar, muhtemelen ji kurdî bêtir, meyla wan ser bikaranîna suryankiya klasîk, erebî an, di babetên derheqê pirtûka pîroz, teolojîk an menqîb-eyan de kêma be ji li ser aramiya nû bû û di deqên bo piştigiriya pîrozbahiyên giştîyê ji otobiyografiyê dûr disekinîn.¹⁷

David Barzane¹⁸

Li ser jiyana David Barzane çavkaniyên agahiyan ên him yekser him neyekser hene. Agahiyên yekser di nivîsên destpêk û dawiya gelek destxetên ku wî kopî kirine û di helbestên wî de peyda dibe. Davidê Yoħannanê Davidê Nisanê Gordoyê ji mala Qardahe li dor 1820an de li herêma Zibârê li gundê Barzânayê hatiye dinyayê. Di 1841 û 1844an de li Aynqawayê ewilî wek mirovekî dinyewî û dû re wek alîkarê keşe jiyaye. Di maweya perwerdehiya gerok a çend mehan de wek rahîp hatiye rahênandin û ligel metran ‘Mar Yusep’, ku ihtimal e Joseph Audo, di 1833-47an de metranê Amêdiyê bû û dû re wek Patrîk Joseph VI hat hijbijartin. Piştî çend rojên li Alqoşê, wî da dû metran çû Dihokê, ku li wir bû keşe, û piştê bi wî re çû gundên dora Zaxoyê. Ciyê herî zêde lê maye xuyaye Bidaro bû ku di sala 1846an de pênc mehê xwe lê derbas kiriye.

Dema pîskopos ew şand malê, rahîp David dest pê gera vir de wê de û jiyaneke dijwar kir. Helbestvan bixwe dibêje, dema ew xebitiye, wî her yek ji malbata xwe li

de hatiye kopîkirin) deq di destpêkê de netemam e; ms. 135.6 kopiya 134 tevî wergera erebî ye, ji aliyê Şamir (Musil 1883) li ser dixwaza Sachau hatiye kirin. Helbest naverokeke wê ya romantîk û macerayî heye û serpêhatiya kurdekî ku dil ketiye jineke bi navê Fatma, wê li Suriyê direvine û tîne herêma Wanê. Carekê, dema hewl dide heywanekî çiyê bikuje, ihtimal e pezkûvî ye, lê dixê lê nakuje. Heywana birîndar li neçîrvan vedigere, dema şer dîkin, di zinarê re wer dibin. Di nav heman koma destxetan de, Jeremiah Şamir adaptasyonekê û wergereke qismî ya Faris El Chidiac, *A practical Grammar of the Arabic Language* (London 1856) dike bo Sachau, bi devoka Aynqawayê ya aramiya nû û devoka Hekariyê ya kurdî, îngilîzî, aramiya nû û kurdî di sê stûnan de hatiye bicîkirin û him aramiya nû û him kurdî (hatiye vokalkirin) bi elfebeya suryankiya rojhilat hatiye nivîsandin: nimûne û deqên di ms. 133.1, listeya peyvên di ms. 136 (Mosul 1882-83) de. Bo van deqên kurdiya garşûnî bnr. K. Fuad, *Kurdische Handschriften, Verzeichnis der orientalischen Handschriften in Deutschland* 30 (Wiesbaden: F. Steiner, 1970), 121-6.

17 Ji bo çavgerandineke li ser siyaseta zimanî yên dêrên suryaniyên rojhilat di navbera sedsalên 16 û 19mîn de, bnr. H. L. Murre-van den Berg, “Classical Syriac, Neo-Aramaic, and Arabic in the Church of the East and the Chaldean Church between 1500 and 1800,” di nav *Aramaic in its Historical and Linguistic Setting*, Akademie der Wissenschaften und der Literatur, Mainz: Veröffentlichungen der Orientalischen Kommission 50, ed. H. Gzella and M. L. Folmer (Wiesbaden: Harrassowitz, 2008), 335-51.

18 J. M. Fiey, *Assyrie Chrétienne* (Beirut: Imprimerie catholique, 1965), c. I, 169-71.

gundekî veşartîye. Hejarî û şîn nebûye asteng gelek destxetên ku desteyeke ji wan heta îro hatine, kopî bike.¹⁹

Pîskopos hatiye agahdarkirin ku axayên kurd ên zibarî êrişî gundê David lê çêbûye kirine û rahîp û malbata wî şandine Xardesa li herêma Sapsapayê. Li wir neh salan maye, di van salan de heşt merivên wî mirine. Yê din li Herpayê mirine bûye şahidê êrişeke kurd a bi ser Şanaya d-Naḥlayê. Ji Zibar û herêma ‘Aqrayê derketiye, li Newala Gomelê (herêma Amediyê) li Kanifallayê bi cî bûye, lê bêsiûdiyê dev jê bernedaye. Jina wî li wir miriye û di 1865an de tekane kurê wî ku ji mirinê xilas bûbû, hezkiriyê berdilê wî Antonê ku gelek alikariya wî dikir, mir. Desxeta dawî ya David kopî kiriye sala 1871ê de kitêbeke duayan e.

Di agahiyên biyografîk de ku dibe dawîya pêşkêşîya wî ya helbesta Sureth, Peder Jacques Rhéthoré David wek rahibekî qenc û bi qabiliyet teswîr dike. Misyonerê frensî yê domîniken helbestvan wek şexs nas kiriye û ji me re qala taliya jiyana wî dike. Xelaya ku di sala 1880an de Musil dabû ber xwe, ew jî da ber xwe. Ji hevalên xwe yî li Musilê alîkarî û parastin xwestiye, lê birçîbûn û tunebûnê ew ji hal de xistiye û li nexweşxaneyêke misyonerên domîniken, bi hezkirin û eleqeya rehîbe û misyoneran dorpêçkirî re dimire. Li gor Rhéthoré, helbestên David populariteyek wan hebû û şeş ji wan di *Recueil de chants religieux en langue chaldéenne vulgaire* de cî girtine ku li Musilê di sala 1886an de çap bûne. Lê Rhéthoré dibêje destxetên bo vê çapê hatiye bikaranîn ne bi qalîte ne.²⁰

Dema jiyana David a biêş tê dîtîn, ne ecêb e ku helbestên wî di nav hestên wek xem, jiyana gunehkar, mirin, jiyana hejar a helbestvan, mirina hezkiriyê kurê wî Anton, hewantebûna vê dinyayê û di dawîya dinyayê de hatina Deccal, mabe. Bi rastî di helbestên suryankiya rojhilat a dereng û aramiya nû de ev motif pir belav in. Bo zêmara li ser mirina kurê wî, modela David helbesteke manend a Khamis bar Qardaḥe bû.²¹

Berheva desxetên wî bixwe yê helbestên wî demekê nêzî Dihokê di kitêbxaneyê Manastira Domînikena Mar Yaqoyê bû û niha parçeyek ji desxetên suryankî yê Domînikên Musilê ye.²² Li gor teswîreke ku bi pênûsa Peder Rhéthoré di rûpelên dawî yê destxetê hatiye şerhkirin, nozdeh helbestên bi suryankiya klasîk, çar helbestên bi aramiya nû û du helbestên bi kurdî dihewîne: *Zêmara* li vir hatiye weşandin û helbesta *Li ser Evîna li vê Dinyayê û Pere, û Hatina Deccal ya di Nêz de*.

19 D. Wilmshurst, *The Ecclesiastical Organisation of the Church of the East, 1318-1913*, CSCO 582, Subsidia 104 (Leuven: Peeters, 2000), 807.

20 B. Poizat, *Jacques Rhéthoré. La versification en soureth (araméen contemporain)*, CSCO 647, Subsidia 131 (Leuven: Peeters, 2013), 64-5.

21 A. Mengozzi, “The Book of Khamis bar Qardaḥe: History of the Text, Genres and Research Perspectives,” di nav *Syriac Encounters*, proceedings of the *Sixth North American Syriac Symposium* (Duke University, Durham, North Carolina, June 26-29, 2011) wê derkeve.

22 Ms. 82 in B. Sony, *Le catalogue des manuscrits du couvent des Dominicains de Mossoul* (Mosul, 1997).

Kurdî di elfebeya suryankiya rojhilat de

Xuyaye ne ihtimal e ku David Barzane li ber destê wî modelên kurdiya garşûnî hebin. Ihtimal e wî bixwe pergaleke têra xwe sofistike îcad kiriye bo dengên kurdî bi elfebeya suryankî binivîsîne (fonem*, lê hin caran alofon* û dengên herî besît jî), qaideyên suryankiya klasîk bi qaide û nîşanên fonetîk ên taybet ku jixwe bo sîstemên din î fonolojîk, yanê di erebî, aramiya nû û belkî farisî de tînan bikaranîn, ser hev vekiriye. Hin tîpên suryankî ku di kurdî de ji yekî zêdetir dîngan tî nivîsandin:

<i>gāmal li jêr bi nîşana dirêjkirinê</i>	/ç'/ dengdara hişk [tʰ]
	/ç/ dengdar
	/c/ dengdar [dʒ]
<i>wāw</i>	/v/
	/w/
<i>kāp</i>	/k/
	/k'/ [kʰ]
<i>pē</i>	/p/
	/p'/ [pʰ]
<i>rēš</i>	/r/
	/r̥/
<i>tāw</i>	/t/
	/t'/ [tʰ]

Di ortografiya kurmançiya modern de bo rîza bêdengên hişk ên behdîni <k'>, <t'>, <p'> û <ç'> nîşaneyên taybet tune, ²³ û ji bo <ç> ya lîzok jî. The *gāmala* bi nîşana dirêjkirinê (ـ) ku bo ç ya erebîya garşûnî û ç an ç ya aramiya nû, wek di

23 Dema li devokên Amediyê û Zaxo de statuya fonemîk a bêhnvedanê MacKenzie pêşniyaz dike bêdengên hişk teqînî (aspirated) wek <þ, t, k>: D.N. MacKenzie, *Kurdish Dialect Studies I*, London Oriental Series cild. 9 (Oxford: Oxford University Press, 1961), 40. Thackstone bêdengên teqînî bêhnşankirî dihele û pêşniyaz dike rîza ne-teqînî bê xêzkirin: W. M. Thackston, *Kurmanji Kurdish. A Reference Grammar with Selected Readings*, 2006 [www.fas.harvard.edu/~iranian/Kurmanji/kurmanji_1_grammar.pdf; last visit November 2013], 4.

Di ortografiya niha ya kurdî de li ser nîşankirina wan dîngan Chyet dibêje “cotê dengdêrên teqînî û neteqînî (p'-p/t'-t/k'-k/ç'-ç) ji aliyê zanyarên sovyet û di çend berhemana de ji aliyê zimanzanên modern bi rîk û pêk hatiye cudakirin. Zanyarên sovyet, ku gelek jî wan ermenkî jî dizanibûn, bêgûman jî vê taybetiya di ermenkî de bandor girtine. Di weşanên kurdî yên modern de bi gelemperî ev nayê dîtin. Di elfebeya erebî de, ji bo jihev cudakirina wan cotên dengdêr tu rê nehatiye dîtin. Lê, li Kurdistanê Iraqê li gor kesên agahî dan min -ku piraniya wan elfebeya erebî bi kar dianîn- cudahî heye, û girîngiya wê ya fonemîk heye”: M.L. Chyet, “Kurmanji Kurdish Lexicography: A Survey and Discussion,” web site of the Kurdish Academy of Language, 1997 [www.kurdishacademy.org/?q=fa/node/142; serdana dawî Mijdara 2013]. Her wiha, sîstema garşûnî ku ji aliyê David hatiye îcadkirin li ser xeta kurdiya li Iraqê ye ku îro bi elfebeya erebî tî nivîsandin.

aramiya nû de erka him bo dengdêr him bo dengdarên nivgirtî (palatal affricates) yên kurdî tê bikaranîn, dibîne. Ne zelal e ka *gāmala* bi nîşaneyê dirêjkirinê di peyva *dêjît* (17a, 18b) de telafuza devokî ya dengdêra nivgirtî ya *dêcît* e an bikaranîna wê de /j/ ([ʒ]ya tengkirî (fricative) heye, li vir bi fonetîka <š> li gor bikaranîna wê ber bi ya tengkirî ve tê dirêjkirin /j/ ([ʒ], li vir bi gelemperî <š> bi nîşaneyê fonetîk <š> tê nivîsandin).

Çend tîpên suryankî, bi taybetî tevî fonetîkan, bêtir li fonemên taybet ên kurdî tê:

<i>bêth, gāmala, dālath, kâp, pē, taw</i> with <i>quššāyā</i>	/b/, /g/, /d/, /k/, /p/, /t/
<i>kâp</i> bi <i>rukkākāhā</i>	/x/
<i>pē</i> li jorî wê xalek	/f/
<i>šin</i> li jorî wê sê xal	/j/

Tîpên *beghadkephath* gelek caran, taybetî di destpeka peyvê de, bi *quššāyā* tê nîşankirin, ku rê li ber xwendina wan a tengkirî bigre. *Kâp* bi *rukkākāhā* di garşûnî de (bo خ) û aramiya nû de bi heman awayî /x/ tê bikaranîn, di aramiya nû de bo h ya etmolojîk jî (wek mînak, *khelmā* ‘xewwn’) tê bikaranîn.

Nîşanên fonetîk, wek xêzîka dirêjkirinê [-] û xala li jor, bi gelemperî bi hibra sor tê nivîsandin. *Pē* bi xalek stûr (li vir sor e) li jor (أ) şiklê ا a erebî texlîd dike û bi peyvên aramiya nû ya kok-erebî tê bikaranîn û her wiha dengê /f/ dihewîne.²⁴ Ne ihtimal e ku *šin* bêyî xalan di *bîr* (5b), *dibêjî* (9a) û *nebêjin* (13d) de telafuza bêlerzok a devokî nîşan bide, berambera /ʃ/ ya kurdiya standard de ye: *ʃi bîr, dibêʃi* (?). Bêtir ihtimal e ku nivîsevan li pey xwe venegeriyaye ku nîşanên fonetîk bi hibra sor nîşan bike. Li gor tipguhezî û teswîrên li ber dest /f/ û /j/ di destxetên kurdiya garşûnî yên Muzeya Iraqê wek ا و ا hatine nivîsandin di helbesta Kreyenbroek weşandiyê wek ا و ا hatiye nivîsandin.

Çendin dengdar hene bo nivîsandina fonem an alofonên (allophones) kurdî ku di ortografiya kurdî ya standard de bi awayekî taybet nehatine nîşankirin. Fonemên semîtîk temsîl dikin û xwezayî ye ku alfabeya suryankî destûr dide bi fonetîkek bêqisûr nîşan bike –dengên ji qirikê (pharyngealized)– an nivîsandina dîrokî gengaz bike, ji ber ku ew bi giştî di peyvên kurdî de yên ji erebî hatine heye. Ew ev in: *hêth*, ji bo dengê qirikê yê bêdeng [ħ] tê bikaranîn ‘e dengê qirikê yên bideng [ç], *têth*, *şādē*, û *şādē* li jor bi xala /z/ya erebî ku bo peyvên wek *wehîd* (2a), ‘*emir* (7b), *beṭal* (1c), *qîşe* (1a), û *rebb el‘ezîm* (6d). *Gāmala* bi *rukkākāhā* beramberî alofona bideng

24 A. Mengozzi, *A Story in a Truthful Language*, CSCO 590, 22-3. Alofonên piştî bidengan [f] an [p^h] ya aramiya dereng /p/ bi giştî di devokên aramiya nû ya bakurê Iraqê ku di peyvên kok-aramî de bi her awayî wek [p] deng dide, tune. Ev belkî rave dike ka çima li vê herêmê ev *pēya* taybet li jorî wê xal ketiye nav peyvên aramiya nû yên ji erebî hatine û tê de /f/ek heye. Li gor ortografiya suryankiya klasîk, *pēya* li jorî wê xal heye (*quššāyā*) nirxek wê dijber heye û alofonê girtî [p] an awayê cotbûyî ya [p:] destnîşan dike.

[ɣ], /x/ ya kurdî û fonema erebî /ğ/ ye: ihtimal e nişankirina fonetik û etimolojik e bo peyvên ji erebî hatine, wek *mexmûn* a ji *mağmûm* (1b) û *xerîb* a ji *ğarîb* (7b). *Încîl* û *însanî* ya standard wek *‘incîl* (4c) û *‘insanî* (11b, 16a, 18a) hatiye nivîsandin, ku dibe nivîsandina fonetik be û *hamzaya* destpêkê ya li pey *i* ya kurt çawa ji qirikê derdikeve wê destnişan dike.²⁵

Di du peyvên de, dengdar du caran tê nivîsandin wek ku bo cotbûna wan destnişan bike: *lezet* <*lezzeta*> (1c), *kulin* <*kollin*> (3a), *gelek* <*gellek*> (3a û 3b), *wê diêşin* <*wittêşin*> ? (3a); *wê diêşin* <*wittêşin*> ? (3a); *dilê* bi sê awayên cuda hatiye nivîsandin: <*dillê*> (3c) bi du *lām*adan, a yekem bi xêzikek veşartî hatiye jêbirin û di <*dilê*> (14c) de yek l maye.

Sîstema nivîsandina fonemên bideng bi qasî sîstema bo bédengan tê bikaranîn dewlemend û nelihev e -bi rastî têr nake.

<i>zqāpā</i> (+ <i>ālap</i>)	/a/
<i>zqāpā</i>	/e/
<i>pthāhā</i>	/e/
	/i/ (one case, beriya <i>h</i>)
<i>zlāmā pšiqā</i>	/i/
– (ketina bidenga dawî bo pîvan li hev bê)	/i/
<i>zlāmā qaşyā</i> (+ <i>ālap</i>)	/ê/
<i>hbāşā</i>	/ê/
	/î/
<i>rbāşā</i>	/û/
	/u/
<i>rwāhā</i>	/u/
	/o/

Ālapa ku her tim li pey *zqāpā* an a *zlāmā qaşyā* bo nivîsandina /a/ yi -wek *ā* ya dirêj a erebî- an /ê/ yê gelek caran bi lînia okultan ku di suryankiya klasîk de nişanek rûniştî ye bo bédengên berê di telafûzê de hebû lê niha tune tê bikaranîn, hatiye nişankirin. Li vir, dema *ālap* dibe matir liktîonîs* wek rêbazeke hînkariyê hatiye bikaranîn. Ev *ālapa* bi *lînia okultan* wekî din di destxetên suryankiya rojhilat de ji bo bidengên dirêj ên di peyvên biyani²⁶ de hatiye bikaranîn, lê di deqên kurdiya

25 *Încîl* di kurdiya garşûnî ms.ya Muzeya Iraqê de bi *ālap* û *yuḍa* destpêkê tê nivîsandin:

مسيحيد wek erebî *إينجيل* (Harrak, *Catalogue*, 31). Balkêş e, *însân*, bi *gāmal* > *jîma* destpêkê hatiye nivîsandin (Harrak tîpguhêziyê de kiriye *جنسان*) di nişeyeke li qeraxa destxetê de (*ibidem*, 28). Ev guhertoyên nivîsandinê dibe ku şaşî bin an, kêmtir dibe ku, guhertoyên devokî yê di telafuza kiteya destpêkê yan van peyvên be.

26 *mater lectionis: di ortografiya îbrankî an aramî de, matir liktîonîs (di latîni de ‘dayika xwendinê) tîpeke bédeng e, hin caran ji bo destnişankirina tîpeke bideng tê bikaranîn. Wek mînak, dadgehê di bin konan de ya monxolan Ala Dax, daçeka b- tê beriya wê, wisa tê nivîsandin: *دخا* ms. Mingana 149 (dated 1893), 155b.

garşûnî de ku ji aliyê Pennacchiotti, Kreyenbroek û Harrak hatine teswîrkirin xuya nake. *Zqâpâ* tevî *âlap* – bê *linea occultan* – carcaran ji bo nîşankirina *â* ya dirêj a di peyvên kok-erebî yên di aramiya nû de xuya dike, wek awayê nivîsandina bi garşûnî: wek mînak, *مڪمەل* ‘mukemel’.²⁷

Di sistema rastnivîsa suryankî de neliheviya nivîsandina bidengên kurdî belkî dikare bi statuya fonolojîk a bidengên di aramiya nû de dikare bê ravekirin. Di gelek devokên aramiya nû yên li Iraqê de, dirêjîya bidengan ne fonemîk e, ji ber ku bidengên kurt û dirêj alofon in û di belavbûna temamker (complementary distribution) de xuya dikin: bidengên dirêj di kîteyên vekirî de û bidengên kurt ên hember di kiteya girtî de. Statûya fonolojîk a /o/ û /u/ ne diyar e di hin devokên aramiya nû de, ku ihtimal e nivîsandina /u/ya kurdî bi *rbāšā* an *rwāhā* rave dike. /i/ ([i] or [ī]) ya navîn a kurt an bê nîşan hatiye nivîsandin an bi *zlāmā pšiqā* hatiye nivîsandin. Carekê, dema beriya *h̄ya* qirikê tê, bi *pthāhā* hatiye nivîsandin: *bēsīheta* (1b). Dema nehatiye nivîsandin, belkî ji bo pirsgirêka weznê wek kîteyekê nehatiye hesibandin. Diserregavkirina wê -eynen di- di parastina binemaya kîteyî ya risteyên çarîna girîng e. Di her çarînê de çar risteyên bi qafiyê hene û gelek risteyan de deh bideng, yanê deh kîte hene. Riste neh -an yanzdeh-kîteyî ne. Şêweya qafiyeyê û binemaya kîteyî ya van helbestên suryankî û aramiya nû, ku dikare wek melodiyeke suryankiya klasîk bê gotin. Di 3d (-*şin* -*şim*) de qafiyeyek biqisûr xuya dike, lê qafiyeyên dawîn ku çar risteyên her çarînê dike komek bi gelemperî adetî ne û rê li ber guherînên rêzimanî yên nayê qebûl kirin vedikin. Wek mînak, *fera* qafiyeya çarînê ye ku mirov li bende ye awayê rast *ferē* be û qafiyekirina *îmanî* (16c) *îmanê* be.

Di garşûnî de, qaideyên adetî yên ortografiya erebî wek *tā̄ marbūta*, naşibe *lāma* artîkela diyar a beriya bédengên şemsî, *âlap* bo *ā*, hin caran jî *alif waşla* û heta *alif maqşûra* (bi *yuda* dawiyê tê nivîsandin), gelek caran elfebeya suryankî de hatiye qebûl kirin, vê kiriye ku Briquel-Chatonnet bêje garşûnî sistemeke nivîsandinê a ‘pensé en arabe’ (fikirîna bi erebî) ye.²⁸ Berovajî vê, xuyaye David Barzane hewl daye devokeke kurdî binivîsîne ku qaideyên rastnivîsê yên bixwe tê de tunebe. Bi rihetî qaideyên ortografiya suryankî yên adetî bi kar aniyê: Gihaneka kurdî *û* bi adetî wek *w*-ya suryankiya klasîk, peyva bi ya *dû* xwe tê gotin ne-kîteyî nivîsandiyê;²⁹ navdêrên

27 A. Mengozzi, *A Story in a Truthful Language*, CSCO 589, 318.

28 F. Briquel Chatonnet, “De l’intérêt de l’étude du garshouni et des manuscrits écrits selon ce système,” in *L’Orient chrétien dans l’empire musulman. Hommage au Professeur Gérard Troupeau*, Studia arabica 3, ed. G. Gobillot and M.T. Urvoy (Paris: Éditions de Paris, 2005), 466. Kiraz erebiya garşûnî - bi termînolojiya wî “suryo-erebî” - wek sistema tîpguhêziyê, yanê “nexşekirina sistemeke nivîsandinê di nav yeka din de di asta grafemê de” disenifîne, û kurdiya garşûnî - “Suryo-kurdî”- wek şemayek tîpguhêziyê, yanê “nexşekirina dengên zimanekî di nav grafemeke di asta fonemê de (G. A. Kiraz, *Türreş Mamllā*, 292).

29 Ev rastnivîs, ku bi ortografiya suryankiya klasîk re li hev e, ihtimal e telafûza devokî an a bilez a bidenga *û* yê wek *u* ya kurt an wek bédenga *w*- ye. Li gor vê, xuyaye gihanek wek kîte nehatiye hesibandin ji ber hesabê weznê. Di helbesta ku Kreyenbroek weşandiyê,

pirhejmar bi *seyāmē* hatiye nişankirin; morfema zeliqî *-d* di paşbendika kurdî *-êd* de wek sabordînor (subordinator) a aramî ku bi peyva dû xwe re tê gotin (*-ê d-*) (proclitic) hatiye nivîsandin;³⁰ *yud* bi nişana jor *âlapê* hatiye nivîsandin, ku girêdaneke (ligature) adetî ya suryankiya rojhilat e, li gor qaideyan kêmasiya di çûina (19d)yê de destnişan dike.

Deq û werger

Tîpguhêzî	Dominîkenên Musilê, ms. 82, rr. 143-5
	✦ ܕܘܢܝܝܢܐ ܕܘܢܝܝܢܐ ܕܘܢܝܝܢܐ ✦
	ܕܘܢܝܢܐ ܕܘܢܝܢܐ ܕܘܢܝܢܐ: ܕܘܢܝܢܐ ܕܘܢܝܢܐ ܕܘܢܝܢܐ: ܕܘܢܝܢܐ ܕܘܢܝܢܐ: ܕܘܢܝܢܐ ܕܘܢܝܢܐ:
1. guhê xo biden li wê qiseta qavya mexmûna û her bêsiheta û duniya betala û niya lezeta mirof maya heyrî bi hemû babeta	ܕܘܢܝܢܐ ܕܘܢܝܢܐ ܕܘܢܝܢܐ. ܕܘܢܝܢܐ ܕܘܢܝܢܐ ܕܘܢܝܢܐ. ܕܘܢܝܢܐ ܕܘܢܝܢܐ ܕܘܢܝܢܐ. ܕܘܢܝܢܐ ܕܘܢܝܢܐ ܕܘܢܝܢܐ. ܕܘܢܝܢܐ ܕܘܢܝܢܐ ܕܘܢܝܢܐ. ܕܘܢܝܢܐ ܕܘܢܝܢܐ ܕܘܢܝܢܐ.
2. mirina wehîda nexoşa û tehla li bo day û baba qavya bêhala heçî nedîtî nezanî çî hala lomey min neken ya dost û hevala	ܕܘܢܝܢܐ ܕܘܢܝܢܐ ܕܘܢܝܢܐ. ܕܘܢܝܢܐ ܕܘܢܝܢܐ ܕܘܢܝܢܐ. ܕܘܢܝܢܐ ܕܘܢܝܢܐ ܕܘܢܝܢܐ. ܕܘܢܝܢܐ ܕܘܢܝܢܐ ܕܘܢܝܢܐ. ܕܘܢܝܢܐ ܕܘܢܝܢܐ ܕܘܢܝܢܐ. ܕܘܢܝܢܐ ܕܘܢܝܢܐ ܕܘܢܝܢܐ.
3. birîned min kulin gelek wê diêşin çî derman nînin gelek pi êşin û dilê min rêş bû û gunehêd min boşin û mirin nêzik bû û ezî nexoşim	ܕܘܢܝܢܐ ܕܘܢܝܢܐ ܕܘܢܝܢܐ. ܕܘܢܝܢܐ ܕܘܢܝܢܐ ܕܘܢܝܢܐ. ܕܘܢܝܢܐ ܕܘܢܝܢܐ ܕܘܢܝܢܐ. ܕܘܢܝܢܐ ܕܘܢܝܢܐ ܕܘܢܝܢܐ. ܕܘܢܝܢܐ ܕܘܢܝܢܐ ܕܘܢܝܢܐ. ܕܘܢܝܢܐ ܕܘܢܝܢܐ ܕܘܢܝܢܐ.

“Lawij of Mor Basilius Shim’un”, de gihaneka kurdî û wek pêşbendeke binxêzkirî w- hatiye nivîsandin (G. A. Kiraz, *Tûrrâş Mamllâ*, 308).

30 Heman diyarde (proklîta d- li gor ortografiya suryankiya klasîk bo zeliqandinê jî hatiye bikaranîn wek çawa tê telafûzkirin) di sistema nivîsandinê ya aramiya nû de, ku xwe dispêre elfebe û qaîdeyên suryankiya klasîk, him destxetan de him pirtûkên çapkirî de tê dîtin.

4.	<p>wehîdekim hebû spehî û layîq bû destê wî dayim bi qelem girtî bû Încîl û k'itêba dayim li koşê bû paşê mirina wî babê yexsîr bû</p>	<p>سپهێی هه‌به‌وه‌ی فه‌مه‌ هه‌که‌یه‌یه‌. هه‌سه‌وه‌ی ته‌که‌یه‌یه‌ خه‌ڵه‌یه‌. هه‌هه‌یه‌ له‌سه‌وه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌ له‌سه‌وه‌یه‌. هه‌که‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌*</p>
5.	<p>ya mîrê mezin xolqetê tema tu min ji bîr neka ez kolê tema û gunahêd min bihêla ez 'ebdê tema Xodê şola ta hemû kêrema</p>	<p>ته‌که‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌ هه‌به‌ته‌یه‌. هه‌هه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌. هه‌سه‌وه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌. هه‌هه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌*</p>
6.	<p>ezi feqîrim û qewî xerîbim û ezi zelîlim û qewî yexsîrim ya Xodê min xilas bika ezi bêhalim ya rebb el'ezîm her t'opalam</p>	<p>ته‌که‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌. هه‌هه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌. ته‌که‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌یه‌. هه‌هه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌یه‌. ته‌که‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌یه‌*</p>
7.	<p>roj li min ava bû û duniya tarî bû feqîr bûm û xerîb 'emirê min xilas bû ev duniya betal ji min razî nebû hêviyê min Xodê her lalê te bû</p>	<p>هه‌هه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌. هه‌هه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌یه‌. هه‌هه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌یه‌. هه‌هه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌یه‌. هه‌هه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌یه‌*</p>
8.	<p>xerîbim xerîbim û ezi bêkesim dayim nexoşim û ezi wehîdim û mirin her heqa Xodê şakirim gava ferman dikey û ezi hazirim</p>	<p>هه‌هه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌یه‌. ته‌که‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌یه‌یه‌. هه‌هه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌یه‌یه‌. هه‌هه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌یه‌یه‌*</p>
9.	<p>hemû kes dibêjî mirin ye fera belê zorî nexoşa li hindeka dera û qewî bêç'ara û zor bêy mefera girîn û rûndikan şirînin û şekira</p>	<p>هه‌هه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌یه‌. هه‌هه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌یه‌یه‌. هه‌هه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌یه‌یه‌. هه‌هه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌یه‌یه‌ ته‌که‌یه‌یه‌یه‌یه‌یه‌*</p>

10.	<p>ezi yexsîr bûm li wê duniyaya mirofêd min mirin keyfim nemaya ez bi tenê mehîma li deştan û berîya û dilê min bê xem bû bê ax û oxîya</p>	<p>کەوێ، نەجەبەشەر لە، دەستەتە. مەتەنە، دەچێ، خەفەر نەتەتە. کەوێ، خەفەر، نەجەبەشەر نەتەتە. هەڵبەت، خەفەر، نەجەبەشەر</p>
11.	<p>tê fikirin ya ostan dermanî k'îya bo mirina însanî her tiştek nîya pêxamber ta'mkir mirin û enbîya çakan û salihan û morselin û awlîya</p>	<p>ئەگەر، خەفەر، نەجەبەشەر خەتە. خەتە، خەفەر، نەجەبەشەر نەتەتە. خەفەر، نەجەبەشەر نەتەتە. هەڵبەت، نەجەبەشەر مەتەنە، نەجەبەشەر</p>
12.	<p>Xodê te'ala xulqet kirîna da guhdari wî bîn duniya çunîna û çu xirabî nekeyn em 'ebdêd wîna da li ma nestîne wan heft xezîna</p>	<p>خەتە، نەجەبەشەر، خەفەر. نەتەتە، نەجەبەشەر، دەستەتە نەتەتە. هەڵبەت، خەفەر، نەجەبەشەر نەتەتە. نەتەتە، نەجەبەشەر، نەجەبەشەر خەتە</p>
13.	<p>xoşîya biheştê qiyasî lê nîya bêhed layîqa û zorî cindîya û kes qiyasî neket hindî spehîya û avro nebêjin li ber çavan nîya?</p>	<p>خەفەر، نەجەبەشەر، نەتەتە. خەفەر، نەجەبەشەر، نەتەتە. خەفەر، نەجەبەشەر، نەتەتە. نەتەتە. هەڵبەت، نەجەبەشەر، نەتەتە نەتەتە</p>
14.	<p>cehenem bêkara zorî nexoşa 'ezabek mezina bo ruhêd reşa qetlî û zenahan li dilê wan xoşa dê hingî pişman bin û şola wan boşa</p>	<p>خەفەر، نەجەبەشەر، نەتەتە. خەفەر، نەجەبەشەر، نەتەتە. نەتەتە. هەڵبەت، نەجەبەشەر، نەتەتە نەتەتە. نەتەتە، نەجەبەشەر، نەتەتە مەتەنە، نەجەبەشەر</p>

15.	<p>çeka em bikeyn tûbe li gunaha? da Xodê li ma bihêli hemû qebaha zehmeta li hêlanê ew wextê fetha li bo mirof geştê bi li kêşanê ruha</p>	<p>لەو کاتە کەم خێم دەتکە لەو نەتە. تەم جەژنە لەتە دەتکە بێجە فەتەتکە. بەسجەتە لەو کاتە کەم جەژنە فەتەتکە. لەو جەژنە کەم جەژنە لەو کاتە بەتەتکە *</p>
16.	<p>wextê derkêvî ruhê însanî hingî hazir dibî mêrikê şeytanî pisyar dêketin: bi kî tînê îmanî? ciwabî zehmeta bo mirof nezanî</p>	<p>جەژنە تەم جەژنە جەژنە. بەتەتکە تەم جەژنە بەتەتکە. بەتەتکە تەم جەژنە بەتەتکە. بەتەتکە تەم جەژنە بەتەتکە *</p>
17.	<p>tirsek mezina dêjît li ber qazî qazî Xodêya bertil nexwazî canê wi hingî hemû dêlerzî şer'ê wi dêket her bi surî û tazî</p>	<p>بەتەتکە تەم جەژنە تەم جەژنە. تەم جەژنە تەم جەژنە تەم جەژنە تەم جەژنە تەم جەژنە تەم جەژنە تەم جەژنە تەم جەژنە تەم جەژنە تەم جەژنە *</p>
18.	<p>eger saliha ruhê însanî dêjît li biheştê li xoşîyêd dîwanî eger minafîqa peşkê şeytanî bi cehenem dêsojît bi k'ibrît û dermanî</p>	<p>تەم جەژنە تەم جەژنە تەم جەژنە تەم جەژنە تەم جەژنە تەم جەژنە تەم جەژنە تەم جەژنە تەم جەژنە تەم جەژنە تەم جەژنە تەم جەژنە تەم جەژنە تەم جەژنە *</p>
19.	<p>xilasî raborî çî 'îlac nîna hawar dêçekeyn hemû d sotîna hata bîra me tûbe şîrîna çûîna agirî her reşa û şîna</p>	<p>تەم جەژنە تەم جەژنە تەم جەژنە تەم جەژنە تەم جەژنە تەم جەژنە تەم جەژنە تەم جەژنە تەم جەژنە تەم جەژنە تەم جەژنە تەم جەژنە تەم جەژنە تەم جەژنە *</p>
		<p>تەم جەژنە تەم جەژنە تەم جەژنە تەم جەژنە</p>

ÇAVKANĪ

- Bausani, A. "Le lingue islamiche. Interazioni e acculturazioni." In *Il mondo islamico tra interazione e acculturazione*, ed. A. Bausani and B. Scarcia Amoretti. Roma: Istituto di studi islamici, 1981.
- Bausani, A. "Letteratura neopersiana." In *Storia della letteratura persiana*, ed. A. Pagliaro and A. Bausani. Milano: Nuova Accademia, 1960.
- Borbone, P. G. "Syrotrurcica 1: The Önggüds and the Syriac Language." In *Malphono w-Rabo d-Malphone. Studies in Honor of Sebastian P. Brock*, Gorgias Eastern Christian Studies 3, ed. G. A. Kiraz. Piscataway, NJ: Gorgias, 2008.
- Borbone, P. G. "Syrotrurcica 2: The Priest Särgis in the White Pagoda." *Monumenta Serica. Journal of Oriental Studies* 56 (2008): 487-503.
- Borbone, P. G. "Syrotrurcica 3: Hulegu's rock-climbers. A short-lived Turkic word in 13th-14th century Syriac historical writing." In *Studies in Turkic philology. Festschrift in honour of the 80th birthday of Professor Geng Shimin*. Beijing: Minzu Dashue Chubanshe, 2009.
- Braida, E. "Garshuni Manuscripts and Garshuni Notes in Syriac Manuscripts." *Parole de l'Orient* 37 (2012): 181-98.
- Briquel Chatonnet, F. "De l'intérêt de l'étude du garshouni et des manuscrits écrits selon ce système." In *L'Orient chrétien dans l'empire musulman. Hommage au Professeur Gérard Troupeau*, Studia arabica 3, ed. G. Gobillot and M.T. Urvoy. Paris: Éditions de Paris, 2005.
- Brock, S. P. "Hebrew 2:9a in Syriac tradition." *Novum Testamentum* 27 (1983): 236-44.
- Chyet, M. L. "Neo-Aramaic and Kurdish: An Interdisciplinary Consideration of their Influence on Each Other." *Israel Oriental Studies* 15 (1995): 219-49.
- Chyet, M. L. "Kurmanji Kurdish Lexicography: A Survey and Discussion." Website of the Kurdish Academy of Language, 1997 [www.kurdishacademy.org/?q=fa/node/142; last visit November 2013]
- Dehqan, M. "A Kirmaşanî Translation of the Gospel of John." *Journal of Eastern Christian Studies* 61:1&2 (2009): 207-11.
- Fiey, J. M. *Assyrie Chrétienne*. Vol. I. Beirut: Imprimerie catholique, 1965.
- Fuad, K. *Kurdische Handschriften, Verzeichnis der orientalischen Handschriften in Deutschland* 30. Wiesbaden: F. Steiner, 1970.
- Ĥabbī, Y. "Maḥṭūtāt abraşīyyat 'Aqrā." In *Fahāris al-maḥṭūtāt al-suryāniyya fī l-'Irāq*. Baghdad: Al-Mağma' al-'ilmī al-'irāqī, 1981 [in Arabic].
- Harrak, A. *Catalogue of Syriac and Garshuni Manuscripts. Manuscripts Owned by the Iraqi Department of Antiquities and Heritage*, CSCO 639, Subsidia 126. Leuven: Peeters, 2011.
- Kapeliuk, O. "Language Contact between Aramaic Dialects and Iranian." In *The Semitic Languages. An International Handbook*, HSK 36, ed. S. Weninger. Berlin: de Gruyter, 2011.
- Kapeliuk, O. "A Contrastive Analysis of Tenses in Urmi Neo-Aramaic and in Kurdish." In *Beiträge zur semitischen Dialektologie. Festschrift für Werner Arnold zum 60. Geburtstag*, ed. R. Kutý, U. Seeger and Sh. Talay. Wiesbaden: Harrassowitz, 2013. 161-70
- Kessel, G. "The importance of the manuscript tradition of the 'Book of Grace' for the study of Garšūnī." *Parole de l'Orient* 37 (2012): 215.
- Kiraz, G. A. *Türrāş Mamllā. A Grammar of the Syriac Language*, vol. 1 *Orthography*. Piscataway, NJ: Gorgias Press, 2012.
- Kreyenbroek, P. G. "The Lawij of Mor Basilios Shim'un: A Kurdish Christian Text in Syriac Script." *Journal of Kurdish Studies* 1 (1995): 29-35.
- MacKenzie, D.N. *Kurdish Dialect Studies I*, London Oriental Series vol. 9. Oxford: Oxford University Press, 1961.
- Maggi, M. and P. Orsatti. "Two Syro-Persian Hymns for Palm Sunday and Maundy Thursday." In *The Persian Language in History*, ed. M. Maggi and P. Orsatti. Wiesbaden: Harrassowitz, 2011.

- Marazzi, U. "Sull'importanza dei testi osmanli in caratteri siriaci." In *Studia Turcologica memoriae Alexii Bombaci dicata*, ed. A. Gallotta and U. Marazzi. Napoli: Istituto universitario orientale, 1982.
- Mengozi, A. *A Story in a Truthful Language. Religious Poetry in Vernacular Syriac from (North Iraq, 17th century)*. CSCO 589-90, Scriptorum Syri 230-1. Leuven: Peeters, 2002.
- Mengozi, A. "The History of Garshuni as a Writing System: Evidence from the Rabbula Codex." In *CAMSEMUD 2007. Proceedings of the 13th Italian Meeting of Afro-Asiatic Linguistics, held in Udine, May 21st-24th, 2007*, ed. F. M. Fales and G. F. Grassi. Padova: S.A.R.G.O.N. Editrice e Libreria, 2010.
- Mengozi, A. *Religious Poetry in Vernacular Syriac from Northern Iraq (17th-20th Centuries)*. An *Anthology*, CSCO 627-8, Scriptorum Syri 240-1. Leuven: Peeters, 2011.
- Mengozi, A. "Persische Lyrik in syrischem Gewand. Vierzeiler aus dem Buch des Khamis bar Qardaḥe (Ende 13. Jahrhundert)." In the proceedings of the *Syrologentag* (Göttingen, 16.-17. Dezember, 2011). Forthcoming.
- Mengozi, A. "The Book of Khamis bar Qardaḥe: History of the Text, Genres and Research Perspectives." In *Syriac Encounters*, proceedings of the *Sixth North American Syriac Symposium* (Duke University, Durham, North Carolina, June 26-29, 2011). Forthcoming.
- Murre-van den Berg, H.L. "Classical Syriac, Neo-Aramaic, and Arabic in the Church of the East and the Chaldean Church between 1500 and 1800." In *Aramaic in its Historical and Linguistic Setting*, Akademie der Wissenschaften und der Literatur, Mainz: Veröffentlichungen der Orientalischen Kommission 50, ed. H. Gzella and M. L. Folmer. Wiesbaden: Harrassowitz, 2008.
- Pennacchietti, F. A. "Un manoscritto curdo in karshuni da Aradin (Iraq)." *Annali dell'Istituto Universitario Orientale di Napoli* 36 (1976): 548-52.
- Poizat, B. *Jacques Rhétoré. La versification en soureth (araméen contemporain)*, CSCO 647, Subsidia 131. Leuven: Peeters, 2013.
- Proverbio, D. V. "Turco-Syriaca. Un caso estremo di sincretismo linguistico e religioso: i libri di Tommaso Ṣarrāf da Edessa (XVIII sec.) nella biblioteca portativa di Tommaso Caldeo da Al-qōš." *Miscellanea Bibliothecae Apostolicae Vaticanae* 11 (2004): 583-635.
- Prym E. and A. Socin, *Kurdische Sammlungen. Erzählungen und Lieder in den Dialekten des Tūr 'Abdīn und von Bohtan*, a. *Die Texte*. St. Petersburg: Commissionaires de l'Académie Impériale des sciences, 1890.
- Sabar, Y. *The Folk Literature of the Kurdistan Jews: An Anthology*, Yale Judaica Series 23. New Haven, CT: Yale University Press, 1982.
- Sabar, Y. *A Jewish Neo-Aramaic Dictionary*. Semitica Viva 28. Wiesbaden: Harrassowitz, 2002.
- Sachau, E. *Verzeichnis der syrischen Handschriften der Königlichen Bibliothek zu Berlin*. B. 1. Berlin: Asher, 1899.
- Sims-Williams, N. "Early New Persian in Syriac script: Two texts from Turfan." *Bulletin of SOAS* 74:3 (2011): 353-74.
- Sony, B. *Le catalogue des manuscrits du couvent des Dominicains de Mossoul*. Mosul, 1997 [in Arabic].
- Teule, G. B. "The Syriac Renaissance." In *The Syriac Renaissance*, Eastern Christian Studies 9, ed. G. B. Teule and C. Fotesco Tauwinkl. Leuven: Peeters, 2010.
- Thackston, W. M. *Kurmanji Kurdish. A Reference Grammar with Selected Readings*. 2006 [www.fas.harvard.edu/~iranian/Kurmanji/kurmanji_1_grammar.pdf; last visit November 2013]
- Wilmshurst, D. *The Ecclesiastical Organisation of the Church of the East, 1318-1913*, CSCO 582, Subsidia 104. Leuven: Peeters, 2000.
- Younansardaroud, H. "Die türkischen Texte aus dem Buch 'Manuel de Piété' von Paul Bedjan (1893)." In *Studia Semitica et Semitohamitica. Festschrift für Rainer Voigt anlässlich seines 60. Geburtstages am 17. Januar 2004*, Alter Orient und Altes Testament 317, ed. B. Burtes, J. Troller and H. Younansardaroud. Münster: Ugarit, 2005.